


Pîlotê Sucdarê Helebceyê Tariq Ramadan:

Ez bi emrê Talebanî hatim azadkirin

Pîlot Tariq
Ramadan di
dema Saddam
Hisêyn de pîlotê
şer bû. Di
destpêka 2005
an de ji aliyê
Hêza Ewlekariya
Herêma
Kurdistanê-



Asayisê ve hatibû girtin. Bi beşdarbûna bombebarankirina Helebceyê hatibû suçdarîkirin. Ramadan demek dirêj li zindana Silêymaniyê girtî ma. Di dawiya 2008 an de, di dema tedawiyê de ji hepsê bazda. Tariq Ramadan mehkum e û lê digerin.

Rêvebirê EuroKurd Human Rightsê rojnamevan Gabar Çiyan û rojnamevanê inglîzî Gary Trotter xwe gihandin Tariq Ramadan û pê re axifîn. Hevpeyvîna wî sibê di www.eurokurd.net de belav dibe.

Tariq Ramadan di hevpeyvînê de îdîa dike ku, kesê emirê azadkirina wî ji zindanê daye, Serekomarê Iraqê û Serokê PUK ê Celal Talebanî ye. Ramadan li ser pirsê û qirkirina Helebceyê xwe amade dibîne ku derkeve pêşberî dadgehek navnetewî.

Zarathustra News – zoroaster@comhem.se